Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :818 06-Kanûn- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Karasu: PKK li Şingalê nîne. Bila xweserî hebe kîjan Êzîdî bi rê ve dibe bila bibe



**Mustafa Karasu diyar kir ku PKK`ê xwe ji Şingalê vekişandiye û got, “Nêzîkatiya me ji bo xweserî û rêveberiya Şingalê meseleyeke exlaqî û wijdanî ye. Bila Şingal xweser be, kîjan Êzîdî bi rê ve dibe bila bibe.”**

Endamê Konseya Rêveber ya KCK’ê Mustefa Karasû têkildarî peymana di navbera PDK-Hikûmeta Iraqê de û geşedanên piştî wê ji Medya Haberê re axivî. Karasû got, ‘’Niha radibin dibêjin ‘nizanim PKK wê çi bike’. Hûnê xweseriya Êzîdiyan nas bikin, ne xweseriya PKK’ê. Hûnê xwerêveberiyê bidin wan.’’

Karasu li ser mijarê wiha axivî: ‘’Civaka Êzîdî ew peyman qebûl nekir. Lewre di nava wê peymanê de Êzîdî nînîn, saziyeke Êzîdiyan nîne. Bi navê Êzîdiyan ti kes nîne. Fermana 74’an li vê civakê rabû, hindik mabû tine bibe. Vî gelî tecrûbe ji vê derxist. Naxwazin careke din ferman li wan rabe. Rabûna fermaneke din tê wateya tinebûna wan. Ya rast di vê fermana dawî de wê biqediyana. Vî gelî qebûl nekir. Wê demê îradeya vî gelî divê li ber çavan bê girtin.

Gelo ev Xweserî li dijî kê ye? Gelo li cîhanê xweserî nîne? Ewropa, Emerîka çima xwedî li vî mafê xweseriyê yê vî gelî dernakevin? Wê bihatana qirkirin. Gelo Êzîdî wê li wir dewletê ava bikin? Gelo wê bêjin, ‘Me li vir, li Şingalê dewletek ava kir?’ Tişteke wisa heye?

Gelo çi zerera vê xweseriyê li PDK’ê, li rêveberiya başûrê Kurdistanê heye? Li şûna ku piştgiriyê bide, bi vî rengî tevdigere. Bi rastî jî me fêhm nekiriye. Dibêjin wê 10 hezar polîs biçin wê derê. Çima wê biçin? Ew gel dikare li wir ewleyiya xwe, asayişa xwe pêk bîne.

Ev şaş in. Nabe ku ji bo xatirê dewleta tirkî vê bikin. Dewleta tirkî di her mijarê de şantajê dike.

PKK’ê xwe ji wir vekişandiye. Em dibêjin bila li wir xweserî hebe, kî bi rê ve dibe bila bi rê ve bibe. Tenê bila Êzîdî xwe bi rê ve bibin. Bila Êzîdî jî xwedî li xweseriyê derkevin. Êzidiyên nêzî PDK’ê jî yên nêzî YNK’ê jî bila daxwaza xweseriyê bikin. Çima naxwazin? Eger Êzidiyek xwerêveberiyê, xweseriyê nexwaze, ew ne Êzidiyekî rasteqîn e. Bila xweseriyê bixwaze, nêrîna xwe çi dibe bila bibe. Tu xwe bi xwe bi rê ve bibe. Eger di sala 2014’an de te xwe bi xwe bi rê ve bibira, wê rewş bi vî rengî nebûya, tu yê ji warê xwe nereviyabûya. Rêveberiya te wê li ber xwe bida.

Iraq jî bila meseleyê bi diyaloga bi Êzidiyan re çareser bike. PDK jî bila hurmetê nîşanî rêveberiya xweser a li wir bide. Ev yek wê qîmetê PDK’ê zêde bike. Wê qîmetê Iraqê jî zêde bike. Êzidiyan rêveberiya xweser ava kiriye û Iraqê jî qebûl kiriye, eger bi vî rengî bibe Iraq wê ji nişka ve mezin bibe, wê îmaja wê biguhere. Tişta em dibêjin ev e; bila xweser bin, xwe bi xwe bi rê ve bibin, kî dike bila bike. Nêzîkatiya me tenê exlaqî û wijdanî ye. Divê nêzîkatî jî hemû exlaqî û wijdanî be. Niha radibin dibêjin ‘nizanim PKK wê çi bike’. Hûn ê xweseriya Êzidiyan nas bikin, ne xweseriya PKK’ê. Hûn ê xwerêveberiyê bidin wan. Li wir bila hilbijartin bibe, di encama hilbijartineke demokratîk de kîjan Êzidî hate hilbijartin bila wê derê bi rê ve bibe. Îradeya wan e. Nêzîkatiya me bi vî rengî ye. Pirsgirêk bi aloziyê çareser nabe. Nêzîkatiya li civaka Êzidî karakterê mirovan nîşan dide. Tu bi çi rengî nêzî Êzidiyan dibe, hingî exlaq, wijdanê te, nêrîna te ya siyasî jî bi wî rengî ye. Ew pîvan e, ji bo mirovan jî ji bo rêxistinan, ji bo dewletan jî pîvaneke. Berpirsyariya her kesî ye ku tevkariyê li xweseriya Êzidiyan bike.’’

# Digel ewlekariya hundir parastina tenduristiyê jî girtine ser milê xwe

**Dilîn EHMED/Ronahî-Qamişlo**

Piştî belavbûna vîrûsa korona û biryara qedexeya derketina derve ya Rêveberiya Xweser, erkekî giran ket ser milê Tirafîk, Hawarî û Asayişê. Ji bo pêkanîna vî erkî ev sazî 24 saetan li ser kar in. Ji bo naskirin û şopandina kar û xebata van saziyan, me bi rêveberê Asayişa Hewarî ya bajarê Qamişlo Dilbirîn Selmo re hevdîtinek kir. Selmo ev agahî dan me: “Di nava bajêr de nuqteyên me yên sabit hene û dewriyeyên me jî 24 saetan di nava liv û tevgerê de ne. Karê ku di qedexeyê de ji me tê xwestin ew e ku, li cihê belavkirina gaz û nan ku xelk lê kom dibin, em wan ji hev dûr bikin. Herwiha kesên ku biryarê paşguh dikin, em



carekê-du caran hişyariyê didin wan. Digel şiyariyê yên qedexeyê binpê dikin em wan teslîmî Hêzên Ewleyiya Hundir dikin. Lê em dikarin vê bêjin; vê carê miletê me bi me re dibe alîkar. Tevî ku qedexe li ser karkerên rojane giran e jî, gelê me heta astekê gihiştiye wê baweriyê ku ev qedexe ji bo parastina tenduristiya wan e.”

### “QEDEXE JI BO PARASTINA TENDURISTIYA WE YE”

Li ser heman mijarê rêveberê Ewlekariya Bendên li ser rê yên Asayişa Hundir Eymen Silêman jî wiha axivî: “Di vê rewşa dawî ya belavbûna vîrûsa korona de,



li gorî biryara rêveberiyê em dixebitin. Piştî biryara qedexeya derketina derve, me hêzên xwe li bendên ketin û derketina bajêr bi cî kirin. Hêzên me 24 saetan dixebitin. Berî her tiştî beşa me ya tenduristiyê ji bo parastina tenduristiyê her sibe mask û lepikan li endaman belav dikin. Dewriyeyên me jî digel hêzên hwarî li nava bajêr digerin. Kesên qedexeyê paşguh dikin, em bi 5 hezarî wan ceza dikin. Xwediyên dikanan jî çend caran tên şiyarkirin. Piştî wê yên dikanên xwe vedikin tên cezakirin.”

Eymen Silêman axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Yên xwedîerd rojê carekê karin biçin ser erdê xwe û vegerin. Ji bilî rewşên awarte, em ti kesî derbasî bajêr nakin. Ji bo bazirganan jî ji 10ê şevê heta 4ê sibê rê ji wan re vekirî ne. Banga me ji gelê me re ew e ku bi me re bibin alîkar.









Çimkî ev qedexe ji bo parastina tenduristiya wan e.”

### “HETA JI ME BÊ EMÊ BI WAN RE BIBIN ALÎKAR”

Ji rêvebiriya trafîka herêma Cizîrê Fehd Xeybî jî li ser xebata xwe wiha axivî: “Piştî belavbûna vîrûsa korona li kantona Cizîrê, bi taybetî li bajarê Qamişlo, me li nava bajêr nuqteyên xwe zêde kirin. Çi erebeyên çûnhatina wan qedexe û yên biryarê pêk naynin, em xwediyên wan ceza dikin. Yên cara duduyan qedexeyê binpê dikin em erebeyên wan li cem xwe dihêlin.”

Fehd Xeybî axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Heta ji me tê em bi galê xwe re dibin alîkar. Erebeyên me gelek caran li ber deriyên nexweşxaneyan disekinin. Ji bo rewşên awarte alîkariya xelkê dikin. Hêviya me ji gel ew e ku biryarên rêveberiyê paşguh nekin û bi me re bibin alîkar.”

# KNK’ê encama civînên xwe yên li Başûr eşkere kir



***Şandeya KNK***’ê têkildarî encama hevdîtinên xwe yên li Başûr, daxuyaniyek da çapemeniyê. KNK’ê diyar kir ku ji bilî PDK’ê, bi partiyên Başûr tevan re civiyane û helwesta wan erênî bûye. Hevserokê KNK’ê diyar kir ku daxwaziya hevdîtinê ji PDK’ê kirine, lê hê bersiv nedaye. ***R-5***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 818 06-Kanûn- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Çeteyên dewleta tirkî li Efrînê civakê cirm dikin

Çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker malbatên kesên revandîn neçar dikin ku li hemberî berdana wan, fidyeyê bidin.***R-2***



# “Bi hezaran gerîla hatin alîkariya me”

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdê, di bernameyeke taybet ya Ronahî Tv de, diyar kir ku di şerekî gengaz yê di navbera hêzên kurdî de, wê bi ti awayî li cem aliyê êrişker cih negirin û qebûl nekin ku aliyek rewşeke defacto bisepîne. Herwiha got, “ Di dema şerê Kobanê de bi hezaran gerîla hatin alîkariya me, bi salan li kêleka me şer kirin, ji wan 4 hezar ji bo parastina Rojava şehîd bûn.” ***R-2***




## Siyasetmedarên Kurd: Divê Hewlêr û Bexda rêzê ji vîna Êzîdiyan re bigirin



Siyasetmedarên Kurd gotin, divê PDK li hemberî vîna civaka Êzîdî rêzdar be. Mafê ti kesî nîne ku rêveberiya wê herêmê hilweşîne û serdestiya xwe bi ser de bisepîne. ***R-4***

## Li Qamişlo navendeke din ya karantînayê vedibe



Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo nexweşiya koronayê (Covid-19) li Qamişlo amadekariya vekirina navendeke karantînayê ya mezin dike. ***R-6***

## Li Helebê pêşangeha tabloyên zarokên şehîdan



Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Helebê ji bo xurtkirina behreya zarokan pêşangeha wêneyên zarokan vekir. ***R-7***

# Mazlûm Ebdê: Em sepandina şerê li hemberî PKK'ê napejirînin

Mezlûm Ebdê li ser êrîşeke gengaz ya dewleta tirkî û PDK`ê got, eger aliyek êrîş bike, emê li hember rabin. Em bi ti awayî êrîşeke wisa û rewşeke defacto qebûl nakin.

Mezlûm Ebdê diyar kir ku di şerekî gengaz yê di navbera hêzên kurdî de, wê bi ti awayî li gel aliyê êrîşker cih negirin û wê qebûl nekin ku aliyek rewşeke defecto derxe holê. Ebdê got divê pirsgirêkên di navbera aliyên kurdî de bi diyalogê bên çareserkirin û diyar kir ku ji ber neamadebûna nûnerên ENKS`ê û nûnerê Emerîka hevdîtinên di navbera ENKS`ê û PYNK`ê de bi awayekî demî rawestiyane.
Mezlûm Ebdê bîr xist ku di dema şerê Kobanê de hêzên kurdî tevan alîkariya wan kirin û got, "Bi hezaran gerîla hatin alîkariya me, bi salan li kêleka me şer kirin, ji wan 4 hezar gerîla ji bo parastina Rojava şehîd bûn. Berî DAIŞ`ê li hemberî Nusra û El-Qaîde jî bi têkoşîneke mezin gelê Rojava parastin. Em gelê Rojava û hêzên parastina Rojava dikarin ji PKK`ê û hêzên din yên kurdî re spasiya xwe pêşkêş bikin."

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdê beşdarî bernameyeke taybet ya Ronahî TV bû û bersiva pirsên rojnamevan Gulistan Xalid da.
Derbarê diyaloga kurdî-kurdî de jî Mezlûm Ebdê wiha axivî:
Diyalog dewam dikin, lê ev demek e me navber dayiyê. Şandeya ENKS`ê demekê çûbû derve, nûnerên Emerîka ku tevlî van hevdîtinan dibû ne amade bû. Ji ber wê me navber da hevdîtinan. Hêviya me ew e ku dema ev alî amade bibin, diyalog dîsa dest pê bike.
Li gor nêrîna min, hinek karên baş hatin kirin. Li ser yekîtiya Kurdên Rojava hinek pirsigrêk hebûn, hindik be jî hatin çareserkirin. Ya ku me ji wan hevdîtinan fêm kirî ew bû ku eger Kurd bixwazin dikarin di nava xwe de pirsgirêkên xwe çareser bikin û yekîtiya xwe çêkin.
Hinek pirsgirêk hebûn, hinek mijarên siyasî yên binakok hebûn, ev nakokî hatin çareserkirin. Hem nêzîkatiyên me yên ji rejima Sûriyê re, hem ji hinek hêzên derveyê wê herêmê re, em gihîştin nêrîneke hevpar.
Li ser şêwazê birêvebirina Rojava jî, em gihîştin lihevkirinê. Her çiqas hê pêk nehatibe jî em gihîştin nêrîneke hevpar. Bi nêrîna min, pirsgirêkên mayîn jî ne yên bingehî ne, bi diyalogê çareser dibin. Dema her du alî hezir bin, wê diyalog dewam bike.
Li ser rojavayiyên koçber bûyîn jî Mezlûm Ebdê wiha got:



"Em dikevin pêvajoyeke nû. Parastina vê herêmê bi şer tenê nabe. Em çawa hewl didin ku bi rêveberiyeke baş bi hêzeke parastinê ya baş hebûna xwe biparêzin, divê em di hêla aborî de jî xwe pêş bixin û xwe bi wî awayî jî biparêzin.
Di dema şer de, gelek kes koçber bûn, hinek kesên dewlemend jî çûn derve. Niha erkê dikeve ser milê wan ew e ku ew jî beşdarî vê pêvajoyê bibin. Banga me ji Kurdên çûyîn derve re ew e ku vegerin. Bi taybetî yên çûyîn Başûr, Bakur û Tirkiyê. Divê vegerin û tevlî vê pêvajoyê bibin. Kesên dewlemend jî divê vegerin herêmê, tevlî kar û xebata me bibin û xizmeta gel bikin. Ev erkê neteweyî yê her kesî ye."

## Dewleta tirkî zeyta Efrînê didize û difiroşe sûkên Ewropa û Emerîka

Çavkaniyeke pêbawer diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker nêzî 90 hezar tonî zeyta zeytûnan ya kantona Efrînê ya dagîrkirî diziye û firotiye Amerîka û welatên Ewropa.

Çavkaniyeke ji navçeya Cindirêsê ya kantona Efrînê ya dagîrkirî eşkere kir ku artêşa tirkî ya dagîrker dest daniye ser kargeha guvaştina zeytûnan ya "Ebdîn Erebo" ya li ser rojhilatê navçeya Cindirêsê.

Heman çavkaniyê diyar kir ku artêşa dagşîrker tenekeyên zeyta dizî li wê kargehê depo dike û di dergehê li gundê Hemamê yê navçeya Cindirêsê re derbasî Tirkiyû û pişt re Ewropa û Amerîka dike.
Li gorî raporên ne fermî, dewleta tirkî ya dagîrker nêzî 90 hezar tonî zeyta zeyûtnên kantona Efrînê diziye.
Berî demekê, di raporeke tora "The Daily Beast" ya amerîkî de hatibû diyarkirin ku artêşa zeyta zeytûnan ji Efrînê bi



qaçaxî derbasî Ewropa û Emerîka dike.
Berî çend rojan jî, çalakvanên medya civakî dîmenek belav kirin ku tê de bi hezaran tenekeyên zeytê li kargeha "Ebdîn Erebo" hatin komkirin da derbasî Tirkiyê bikin.

## Dewleta tirkî û çeteyên wê kehrebe li ser stasyona Elok qut kirin

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê kehrebeya ji bo xebitandina stasyona Elok qut kirin. Ji ber wê ser du hefteyan re ye stasyon ji xizmetê derketiye.

Çavkaniyên herêmê ragihandin ku dewleta tirkî ya dagîrker di nava mehekê de saetekê tene stasyona Elok xebitandiye û nahêle karker biçin stasyonê. Çavkaniyan diyar kir ku artêşa tirkî ya dagîrker çeteyên wê yên bi navê "Artêşa Niştimanî ya Sûrî", kehbreya stasyona Elok dizîne. Ji ber wê ser du hefteyan re ye stasyon bi temamî hatiye rawestandin.



Çavkaniyan da xuyakirin ku ji ber diziyê beşeke mezin ya kehrebeyê, kehrebaya digihîje stasyonê têra xebitandina wê nake. Ji ber wê av nagihîje bajarê Hesekê.
21'ê Adara îsal dewleta tirkî û çeteyên wê karkerên stasyona Elok derxistin û av li ser kantona Hesekê qut kir.

## Çeteyên dewleta tirkî li Efrînê civakê cirm dikin

Çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker malbatên kesên revandîn neçar dikin ku li hemberî berdana wan, fidyeyê bidin.

Sûcên çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker li kantona Efrînê ya dagîrkirî dewam dikin.
Çavkaniyeke ji navçeya Reco ya Efrînê diyar kir ku çeteyên navê "Polîsên Leşkerî" li xwe kirîn 30`ê Mijdarê bi fermana istixbaratên dewleta tirkî 3 sîvîl ji gundê Bedîna revandin.
Li gorî çavkaniyê navên kesên hatîn revandin wiha ne; Xelîl Mihemed Şeban (60), Rifet Hisên Mihemed (43) û Omer Beyrem Elo (65).
Çavkaniyê da zanîn ku malbata Xelîl Şeban neçar maye ku



hezar lîreyên tirkî (338 hezar lîreyên Sûriyê) li hemberî berdana wî, bide çeteyan. Çarenûsa Rifet û Omer jî hê ne diyar e.
Çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker 2 sîvîlên ku berê revandinbûn yên bi navê Ehmed Arif Îbiş û Hesen Arif Oso piştî ku malbatên wan li hemberî berdana her yekî hezar û 500 lîreyên Tirkiyê (522 hezar lîreyên Sûriyê) dane, berdan.

## Li Şehba zarokekî koçber bi mayîna DAIŞ`ê jiyana xwe ji dest da

Li kantona Şehba mayînek ji bermayiyên çeteyên DAIŞ`ê bi zarokekî koçber de teqiya. Di encamê de zarok mir.

Nûçegihanê ANHA ji herêmê ragihand ku dema zarokê bi navê Mihemed Kurdî Îbrahîm (6) li nava zeviyên zeytûnan li navçeya Fafînê dilîst, mayînek ji bermayiyên çeteyên DAIŞ`ê pê de teqiya.
Di encamê de zarok bi giranî birîndar bû û pişt re jiyana xwe ji dest da.
Mihemed Îbrahîm ji bajarokê Qibêsîn yê girêdayî herêma



Babê ya dagîrkirî ye û malbata wî koçberî navçeya Fafîn ya kantona Şehbayê bûye.



# Li Helebê pêşangeha tabloyên zarokên şehîdan

Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Helebê ji bo xurtkirina behreya zarokan pêşangeha wêneyên zarokan vekir.

Pêşangeh li baxçeyê Kulîlkên Şehîdan li taxa Şêxmeqsûd ya Helebê hat vekirin. Li derdora 100 tabloyên 50 zarokên şehîdan yên taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiye xêz kirîn hatin pêşandan.
Di vekirina pêşangehê de hevseroka Meclisa Malbatên Şehîdan ya Helebê Rûşîn Musa axivî û got, divê paşroja zarokan di ewlekariyê de be. Herwiha Rûşîn bîr xist ku Meclisa Malbatên Şehîdan hewl dide desteka zarokên şehîdan



bike û bi wan re eleqedar be. Paşê zarokên şehîdan, deriyê pêşangehê vekirin.
Zarokan di tabloyên xwe de



mijarên mîna pêwîstiya xwendin, parastina tenduristiyê, alên Yekîneyên Paratina Gel (YPG-YPJ) û Meclisa Malbatên şehîdan xêz kirine.
Di dawiya pêşangehê de endamên Meclisa Malbatên Şehîdan diyarî li zarokên şehîdan belav kirin.


## Pêwîstiya avakirina yekîtiya kurdî di şanoyê de

Ji bo ravekirina êşa gelê rojavayê Kurdistanê ji ber nebûna yekîtiya kurdî, Koma Şehîd Osman ya Şanoyê "Bavê Teyar", şanoyeke bi navê "Yekîtî" amade kir.

Koma Şehîd Osman ya şanoyê, ku bi navê "Bavê Teyar" tê naskirin, şanoyeke bi sernavê "Yekîtî" 27`ê vê mehê li ser tora civakî par ve kir.
Şano bi heft lîstikvanan hatiye amadekirin û bi pênûsa nivîskar Behcet Lewend hatiye nivîsandin. Amadekirina şanoyê du mehan dewam kiriye, dirêjayiya dema şanoyê jî 27 deqe û 10 çirke ne.
Di şanoyê de lîstikvan bi rola leşkerên hikumeta Şamê, dewleta tirkî, Emerîkî û Rûsya lîstine. Naveroka şanoyê li ser pêwîstiya avakirina yekîtiyê di nava milet û partiyên siyasî de ye. Herwiha şano bi awayekî komedya hatiye çêkirin.
Lîstikvanê ku cihê sereke di



şanoya "Yekîtî" de girtiye Cuma Xelo (Bavê Teyar) ji ANHA RE axivî:
Xelo diyar kir ku di encamê gera di nava milet de rewşa wan nas kir û li gorî êş û azarên wan kar dikin û wiha domand: "Di dema dawiyê de rewşa xwestina yekîtiyê di nava milet de derket pêş, digotin; "Divê em bibin yek,



divê yekîtiyek bê avakirin".
Xelo wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em jî li hev civiyan, me biryar da ku em kar û xebatekê bikin da ku em ji milet re bidin xuyakirin ku çi tê xwestin em bibin yek? Çawa em ji bazarê dinyayê xilas bibin? Ji ber ku li ser pişta me bazar tê kirin.
Herwiha divê em yek bin da ku dijminê me li hemberî me lawaz bibe. Me xwest em li ser vî bingehî karekî amade bikin."
Herwiha Xelo wiha çimabûna yekîtiyê û cihgirtina wê di hundirê şanoyê de şîrove kir: "Bi tenê yekîtî layîqî xwîna van şehîdan e. Eger yekîtî çênebe wê destkeftiyên ku niha di destê me de li rojavayê Kurdistanê ji destê me derkevin. Ji bo ku em xwedî li xwîn û zarokên şehîdan derkevin pêwîstî bi yekîtiyê heye. Bi vê şanoyê me xwest em vê bangê bigihînin partî û miletê xwe."
Li ser rola kesên ku cihê xwe di nava çand û huner de digirin wiha got: "Hunermend neynik e her kes li wî, kar û xebatên wî temaşe dike, divê hunermend jî kêmaniyê nexe karê xwe de û li ser esasê ku çi ji gel re pêwîst dibe kar bike, îro roj roja daneyê ye roja xebatê ye."

## Wetha Kolanç: Dengbêjî çanda me ye divê em lê xwedî derkevin

**Rojda Aydin/Jin News**

Dengbêj Wetha Kolanç ku bi stiranan şewata dilê xwe tîne ziman, diyar kir ku çanda dengbêjiyê ber bi tinebûnê ve diçe û got, "Em naxwazin çanda me wenda bibe. Divê her kes li çanda xwe xwedî derkeve."

Wetha Kolanç ya li navçeya Cizîrê ya Şirnexê hê zarok hatiye zewicandin û dayîka sê zarokan e. Wetha piştî dizewice hevjînê wê hewiyê tîne ser û ji hev veqetiyan e. Wetha, 10 sal in ku bi sê zarokên xwe re têkoşîna jiyanê dide.

Wetha ya ku dengbêjiyê dike êşa xwe bi stiranan tîne ziman û li aliyekî jî çanda dengbêjiyê dijîne. Wetha ku ji dayika xwe fêrî dengbêjiyê bûye, ji temenê zaroktiya xwe ve dengbêjiyê dike û di nava gel de bi "Eyşe Şan" hatiye naskirin. Wetha diha got: "Dema dayîk, kal û pîrên me stiran digotin min guhdarî dikir. Ez wisa fêr bûm. Em carna bi jinên dengbêj re tên gel hev dengbêjiyê dikin. Ez dema zarok bûm min dest bi dengbêjiyê kir.

### 'Eger ev çand winda bibe wê gel jî winda bibe'

Wetha diyar kir ku berê li dawetan stiran digotin û wiha got: "Em dema diçûn dawet, çol û seyranan me stiranan digotin. Carna me şevbiwêrka dengbêjiyê li dar dixist. Lê êdî di dawetan de jî her kes sazbendan tîne.



Êdî bi awayê xwezayî stiran nayên gotin. Hemû bi dijîtalê tên guhdarîkirin. Çanda me ya berê ya dengbêjiyê tine dibe. Dengbêjî parçeyeke kevneşopiya me ye. Divê her kes li çanda xwe û dengbêjiyê xwedî derkeve. Çand ji bo me gelek girîng e. Eger ew çand winda bibe ew gel jî wê winda bibe."

### 'Em naxwazin çanda me winda bibe'

Wetha got, çanda dengbêjiyê ji dayîk, kal û pîrên me maye, ji bo wê gelek girîng e. Çîroka her stiranekê rastiyeke jiyanê ye. Dema em guhdarî wan stiranan dikin rondik ji çavên me dibarin. Ev stiran rastiya jiyana me ne. Çanda dengbêjiyê niha ber bi tinebûnê ve diçe. Êdî weke berê xweşî nemaye. Stiranên ku ez dibêjim li ser berxwedan, êş, xweşî û şahiyan in. Lê em êdî li dawetan stiranan nabêjin. Lewre êdî dawet bi teknolojiyê û bi sazbendan tên kirin. Ez bixwe di nava jiyanê de stiranan dibêjim. Em naxwazin çanda me winda bibe. Bila her kes li çanda dengbêjiyê xwedî derkeve."



## Ol û Bîrdoziyê Mala Kurdan Xira Kiriye

Sîpan Şînda

Îro di cîhanê de kêm netew hene ku netewbûyîna xwe temam nekirîn. Mixabin Kurd di dunyayê de netewa herî qelebalixe ya ku hêj netewbûyîna xwe temam nekiriye û nebûye xwediyê dewletekê. Rast e, gelek netewên din ji du gerdûnê de hene ku hêj negehîştîne armanca xwe ya dewletbûnê. Lê welê diyar e ku çi qewmiyet di vî warî de himbe Kurdan zehmetiyan û êşan nakişînin. Gelek sedemên vê yekê hene. Yek ji wan parve kirina welatê Kurdan ya di nava çar dewletên hov de ye. Nezanîn û cehalet Kurdan, nevs meziniya serok û rêberên Kurdan, bêtifaqî, bêxîretî, hevkariya bi dijminan re… û hwd. Em dikarin gelek sedeman rêz bikin lê belê ez dixwazim di vê nivîsê de li ser du sedeman bisekinim. Ol û bîrdozî. Du tiştên ku ev demekî dirêj e Kurd xwe pêve girê didin, lê mixabin ji xeynî xwisarê pêve çi tişt ji bi dest wan ve ne hatiye. Di serî de ez bêjim, ez ne li pêşberî çi ol û bîrdoziya çi kesî me. Kî ji çi bawer dike û li pey çi bîrdoziyê ji biçe ji min re ne xem e. Bawerî û hizir takekesî ne. Di nav hemî netewan de, civakan de bawermendî, bîrdozî hene. Ev tiştekî xwezayî ye. Bes di nava wan de bawerî û bîrdozî pija ye. Lê ev yek hêj di nav Kurdan de bi awayekî xav e û ne sewa ne. Dema mirov berê xwe dide pelên dîrokê, mirov dibîne ku jiber ol û bîrdoziyê Kurdan mala xwe û herweha ya hevdû xira kirine. Jiber olî gelek Kurdan çi bi gotinê be çi bi kirinê be hevdû pirr êşandine. Kurdên Misilman her tim heqaret li bawermendên olên din kirine. Mînak Kurdên Misilman, bi Kurdên Êzidî re, bi Nastûriyan re, Keldaniyan re, Ermeniyan re gelek caran bi hêceta olê şer kirine û ji hevdû kuştine. Herweha Kurdên Misilman li ser navê ol birayê xwe yê Kurdê Misilman ji kuştine. Olî demeke dirêj Kurd di vî warî de êxsîr girtiye û hê ji bi awayekî dewam dike. Kurd di vî warî de ji hemû netewên din çavsortirin.

Piştî şerê cîhanê yê duyem demekî dirêj hemî kes bi xwe ve mijûl bûn û çi halê kesê yê dor ol û bîrdoziyan ve mijûl ji bibe nemabû. Piştî salên 1960'î û pêde îcar bîrdoziyên weke Marksîzmê, Maoîzmê, Troçkîzmê, Komonîzmê, Sosyalîzmê ketin di nava Kurdan de û vê carê her yekê dûvikê bîrdoziyekê re girtine û ketine bedena hevdû. Qetbûna mezin ya di vî warî de li Başûrê Kurdistanê di navbera rehmetiyê Mele Mistafa Barzanî û Celal Telebanî de derdikeve û ew dibin du partî. Piştî wê gelek partiyên din ji ava dibin. Evan hêzan jiber bîrdoziyên xwe gelek caran şerê hevdû kirine. Dîsa li Bakûrê Kurdistanê ji ev bîrdozî dikevin di nava xortên Kurdan de û ew ji dikevin bedena hevdû. Ewan ji bi sedan caran jiber bîrdoziyên xwe bend girê dane, şer kirine û hevdû kuştine ji. Ev tiştek ecêb e. Ev ol û bîrdozî hetanî roja me ji her tim bûne kelem û astengî li pêşiya netewîbûyîn û yekîtiya Kurdan. Oldarên Kurdan gotine pêşiyê ola me, paşê netewa me; yen din ji gotine pêşiyê bîrdoziya me paşê netewa me. Ya rast jixwe herduyan ji netew pirr girîng nedîtiye. Îro ji di nava me de gelek ji van hene. Diyar e me hêj aqilê xwe ji tiştekî negirtiye.

# Li Qamişlo navendeke din ya karantînayê vedibe

**Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo nexweşiya koronayê (Covid-19) li Qamişlo amadekariya vekirina navendeke karantînayê ya mezin dike.**



Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, ji destpêka belavbûna koronayê ve gelek navendên karantînayê li seranserê herêmê vekirin û gelek tedbîr girtin da ku korona belav nebe.
Di vê çarçoveyê de, Desteya Tenduristiyê amadekariya vekirina navendeke karantînayê li Qamişlo dike. Navend wê ji 4 qatan pêk bê û gelek ode tê de hene.
Têkildarî mijarê hevserokê Desteya Tenduristiyê Ciwan Mistefa da zanîn ku li seranserê bakur û Rojhilatê Sûriyê li herêman tevan navendên karantînayê hatine vekirin û hemû jî amade ne û nexweş jî tê de tên dermankirin û got, "Di rojên bê de dibe ku li bajarê Qamişlo jimara nexweşan zêde bibe. Di destpêka belavbûna vîrûsê de amadakariyên li Qamişlo di rewşeke awarte de û bi derfetên kêm hatin kirin."
Mistefa wiha domand: "Ji bo vê yekê jî em navendeke din amade dikin û ev navend jî mezin e. Di vê navendê de tevayiya amûrên girêdayî koronayê hatine bicihkirin û di rojên pêş de wê amadekariyên wê bi dawî bibin."
Mistefa di nava axaftinên xwe de behsa rewşa koronayê û qedexeya derketinê li Hesekê û Qamişlo kir û ev agahî par ve kirin: "Ji ber jimara zêde ya koronayê, li Hesekê û Qamişlo rewş hindik mabû ku ji bin kontrolê derkeve. Lê piştî qedexeyê jimara nexweşan kêm dibe."

# Destê jinê bibereket e

**Jiyan BOZO/Ronahî-Amûdê**





Li Sûriyê, ambargoya Emerîka ya bi navê Qanûna Qeyser bûye sedema ketina lîreyê sûrî li hemberî dolarê emerîkî. Vê jî bandoreke neyînî li welatiyan kiriye. Li bakur û rojhilatê Sûrî jî hema hema rojane bihayê pêwîstiyan tê guhertin. Ji bo kêmkirina bandora neyînî Komîteya Aborî ya Jinan, li Amûdê sûka jinan vekir.

**"ABORIYA XWE PÊŞ BIXIN"**

Derbarê mijarê de karkera Sûka Jinan Fatma Mihemed Ebdulqadir wiha axivî: "Ev demek e li vir kar dikim. Ez li ser beşe sebze û meyweyan disekinim. Di beşa me de zeytûn, mast, sebze û meywe tên firotin. Li beşeke din jî xwerek tê firotin. Em du jin li ser beşa sebze û meyweyan disekinin, du jinên din jî li ser beşa xwerek disekinin. Di vê pêvajoyê de tevî zor û zehmetiyan karê me pir baş derbas dibe. Serê sibehan sebze ji me re tê. Em hata êvarê xelas dikin. Ji ber bihayê erzan welatî pir tên gel me. Banga min ji jinan tevan re heye: "Li mal rûnenin, ma heta kengê hûnê destê xwe li ber zilaman vekin. Aboriya xwe pêş bixin û civaka xwe dewlemend bikin ."

**"KAR Û XWBATA XWE BERFIREHTIR BIKIN"**

Herwiha rêvebera aboriyê ya Sûka Jinan Şehnaz Îbrahîm wiha diyar kir: "Nêzî salekê ya me ev sûk vekiriye. 7 jin li gel me kar dikin. Hin ji wan dayîk in, hin jê ciwan in. Jinên li cem me dixebitin ne Kurd tenê ne, yên Ereb jî hene. Li vir bi giranî sebze û xwerek tên firotin. Em niha amadekariya beşeke din jî dikin. Emê kargeheke şîraniyê vekin. Çimkî dikaneke me ya şîraniyê heye û li wir jî du jin kar dikin. Em dixwazin aboriya jinan pêş bixin û bi rengekî komînal kar bikin. Çimkî ciyê jin lê hebe ew kar serkeftî ye. Gel ji bihayê me pir razî ye. Her kes ji gel me pêdiviyên xwe dibe. Em bi hêvî ne ku her jin di nava jiyana aborî de ciyê xwe bigire û karê xwe berfirehtir bike."


# Riya Eyn Îsa-Til Seman hat sererastkirin

Desteya Rêveberiyên Herêmî yên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, xebata sererastkirina riyên di navbera navçeya Eyn Îsa û gundewarê bakurê Reqa de bi dawî kir.



Desteya Rêveberiya Herêmî ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, li ser banga ajokaran riya di navbera navçeya Eyn Îsa û bajarokê Til Seman yê bakurê gundewarê Reqayê de, sererast kir.
Piştî artêşa tirkî û çeteyên wê 9 Cotmeha derbasbûyî êrişî herêmê kirin û riya M4`ê hat girtin, êdî welatiyan riya Eyn Îsayê-Til Seman bi kar anî. Ji ber ku piraniya herêmên bakur û rojhilê Sûriyê bi hev ve girê dide, nexasim herêma Firat, Cizîr, Tebqa û Dêrezorê.
Karê sererastkirina rê li derdora 5 mehan dirêj kir û karkeran rê bi kevirên şkandî, dehil û ziftê dagirtin.
Karkeran ji meha Îlona derbasbûyî ve dest bi kar kir.
Diviya rê bi dirêjahiya 19,600 metreyan were sererastkirin, lê ji ber ku artêşa tirkî ya dagîrker êrişî herêmê kir, sererastkirin temam nebû.
Hêjayî bîrxistinê ye ku kar û xebata sererastkirina vê rê 9 mehan hat rawestandin û 29`ê meha Hezîrana derbasbûyî careke din hat destpêkirin.

# NE ILIZYON, RASTIYA RASTÎ !!



**Medeni FERHO**

Em, bi gotinên aforîzma dest bi nivîsa xwe bikin,
Yek: Çand û şaristanî du tiştên ji hev cûda ne
Du: Li Tirkiyê desthilatdariya olîgarşîk nîne, faşîzma kesk û gewreyê gûr heye.
Şarîstanî êdî têkonolojî ye, dixwaze çandê jî aşînayî teknolojiyê bike; kerhen û cebren, mohra xwe li aqilê mirov bide!...
Eger em, kronoljî, yan jî otobiyografiya pêşketinên sed salên Tirkiyê derbixin, em ê bigihin hîpoteza kevneperestiya sedsala navîn.
Bê mecaz, gelê Kurd, li pêşberî komarek ne demokratîk têkoşînê dike.
Li aliyekî mafya, çete, kontra û qanunên red û înkarê, yanî dewletek durî modernîtê heye...
Kronolojî û bîyografiya sazkarên Komara Tirkiyê Îtîthadî ne; aliyê turanî çete xwedî dikirin, aliyê tirkên spî çete xwedî dikirin... Îro jî tiştek ne guherî ye!..
Desthilatdariya AKP/MHPê, ji desthilatdariya Ecevît, Demîrel, Çîller ne cûdatir e..Hemû desthilatdarên Tirkiyê dijminê gelan bûn, dijminê rewşenbîr û zanyaran bûn û komên olîgarşîk bûn, xwedî zihniyeta Îttîhat Terakî bûn.
Îttîşhat û Terakî, bi saya dergeh, tekke û derwêşxaneyan, "cemaet"ên "col" çêkirin. Osmanê pêşî û Erdoganê paşî, bi saya van dergeh, tekke û derwêşxaneyan, komên xelkê rêxistinî kirin. Xwestin dibin navê cemaetan de, "gel"ekî ava bikin. Ji sala 1914an û pêde, planê "islaheta êşîrên Kurdan" kirin pratîkê.
Mirov dikare vî planê qirêj, dirêjî salên 1884an serdema Kûrt Îsmaîl Hakki Paşa û Mareşal Zekî bike.
Vêce, "karwanê paşverûtiyê"; Cemaeta Gulen/AKP/MHPê+ Ergenekon+Perînçek e.
Em werin ser qunciknivîsên Kurd; balkêş e, di rojên dawî de, bangên çareseriyê zêde bûne; Hin dibêjin, "AKP/MHPê, pêvejoya 1992an daye dest pê kirin", hin dibêjin, "desthilatdariya faşîst têk diçe", êdî temam e... El Heq na!!
Rastî du ne: Yek, dewlet û desthilatdariya Tirkiyê, ji bilî pêvejoya çareseriyê, ji sala 1992an dûr neketiye... Du, desthilatdariya AKP/ MHPê têk biçe, yanî çi?
Pirsgirêk karakterê dewletê ye ev yek. Vegera li Desturnameya 1921ê ye, ev du. Erê kirina Mutabaqata Dolmabahçê ye, ev sê!... Wesselam!...
Ne tenê ev desthilatdarî, kişûmat desthilatdariyên Tirkiyê, qetûlilleh demokratîk nebûne; wek komek olîgarşîk jî nayên nirxandin.
Komar, dekokrasî û edalet, bi zincîrên qanun û desturnamê hatine dîlgirtin. Qanun û Desturnameya Komara Tirkiyê dibêjin, "her kesê li Tirkiyê Tirk e", ev jî înkara gelan e.
Gotina "yek millet, yek al, yek ziman, yek dewlet" encama vê zihniyetê ye, divê ev karakter û zihniyet werê guhertin. Têkçûna desthilatdariyê, çareseriyê nayîne.
Di nava 40 salî de, 10 desthilatdarî têk çûn, çareserî çênebû...
Qirkirina gelê Kurd, projeyek dewletê ye...
Xwedayê vê dewletê artêşa mîrateya "yenîçeri"yên devşîrme ye. Asker û dmeokrasî ji hev dût in!...
Îlîzyonîstî, kehanetên Hezekiel jî, ji bo rewşenbîrên Kurd mirin e.
Aqil û hîpotez, aqil û formulasyon, aqil û neynika dîrokê û xwenasîn!..
Em bi aqilê xwe dibînin; hemû desthilatdariyên Komara Tirkiyê evîndarên miriyan e. Gotina "kurdê herî baş, Kurdê mirî ye" ne fantazî ye, rastî ye "gora betonî" jî encama vê aqiliyetê ye.
Aqiliyeta çete-kontra-mafîa-cemaete îslamîk gora betony ye!...
Gotinên, komar, dewleta hiquq, dewleta modern, di tecrîda li ser Ocalan de, di qirkirina siyasî û fîzîkî de fetisî ne!..
Hemberî ku desthilatdariya AKP/ MHP/Ergenekon/Perînçek, sistema rantê qeyum, sîstema zorê, şer, çete û kontra avakirine jî, 110 sal in, civakek mezin ya hevpar ava nekirine. Her kes, xwe bi eslê xwe, Arnavut, Çerkez, Mekedonî, Laz, Boşnak û hwd. binav dike. Ev cure gel, ne yê "kozê" ne, "col"in û berhemê "telîf"ê ne.
Rastiyeke din; hêza lobîya dewleta Tirkiyê, hevparên nifşê li Ewropa mezin bûne ye, cemaetên dibin sîwana mizgeft-ofîs de kar dikin e. Eger ev lobî nebin, wezîrê karên derve yê Tirkiyê Çavuşoglu, cesaretê di xwe de nabîne ku di civîna NATO de, (30/01 2020 Bruksel) li dijî Wezîrê Karên Derve yê Emerîka Pompeo, sergerdetiyê bike.
Rastiyeke din; Li Başûrê Kurdistanê jî, pêvejoya mizgeft-ofîs, hizbil-kontra û cemaetê dane dest pê kirin. Li Rojavayê Kurdistanê jî cemaeta ofîsî-MÎTê, ENKS ye.
Zihniyet û karaterê Îttîhat û Terakî+Erdogan, Dîwarê Berlînê ye, ev dîwar jî bi ilîzyon û kehanetan nayê hêrivandin.
Divê rewşenbîrên Kurd, rastiyê bi rastî bibînin "dîwarê Berlînê" ji nû de bihêrivînin.



# "Divê em li hemberî dagîrkeriyê bêdeng neminin"

**Berçem Cûdî/ANHA**



Jinên ji pêkhateya Kurd û Ereb yên Kantona Kobanê bertekên xwe li dijî êrîşên dewleta tirkî yên li ser navçeya Eyn Îsa nîşan dan û gotin, "Dewleta tirkî bi êrîşên xwe yên li ser Eyn Îsay amedekariya dagîrkeriyeke nû dike. Bêdengiya hêzên Rûsya jî tê wateya erêkirina wan ya dagîrkeriyê û dayîna alîkariyê."
Dewleta tirkî û komên girêdayî wê zêdetirî du hefteyan e bênavber navenda navçeya Eyn Îsa û gundewarê wê topbaran dikin. Herwiha di encama topbaranan de gelek sîvîl ku piraniya wan jin û zarok in birîndar bûne. Hêzên QSD'ê jî di çarçoveya parastina rewa de bersiva êrîşan didin. Hêzên Rûsya ku qaşo berpirsyarên ewlehiya herêmê ne û baregehên wan li Eyn Îsa hene, bê helwest dimînin. Li dijî êrîşên dewleta tirkî yên li ser Eyn Îsa, jinên ji Kantona Kobanê nêrînên xwe bi me re par ve kirin.

**'Em bi hêzên xwe bawer in'**

Jina bi navê Bûşra El-Mûsa ya ji bajarokê Sirînê piştgiriya xwe ji bo QSD'ê anî ziman û got, "Ev zêdetirî du hefteyan e dewleta tirkî û çeteyên wê bênavber navçeya Eyn Îsa û gundewarên wê topbaran dikin. Qaşo li gorî hevpeymanê hêzên Rûsya ku xwe li Eyn Îsa bi cih kirine, berpirsyarên ewleyiya herêmê ne. Lê weke ku tê xuyakirin ew bê helwest mane û dewleta tirkî jî vê yekê weke şansekê bi kar tîne. Bêhelwestmayîna hêzên Rûsya tê wateya hevkariya wan ya bi dewleta tirkî re. Li ser vî bingehî em wek jinên ji Sirînê baweriya me bi hêzên QSD'ê heye ku wê rê nedin dagîrkeriyeke nû, ji ber vê em ji aliyê fîzîkî û manewî ve piştgiriya wan dikin."

**'Hemû jî ji bo berjewendiyên xwe li bakur û rojhilatê Sûriyê ne'**

Herwiha jina bi navê Fatme Miso ku ji Kobanê ye êrîş nirxand û ev tişt anî ziman: "Di bakur û rojhilatê Sûriyê de çeteyên dewleta tirkî têk çûne. Ji ber wê dixwazin tola çeteyên xwe hilînin. Ez serokê çeteyan Erdogan û kesên piştgiriya wî jî dikin şermezar dikim. Hêzên rûsî, îranî, emerîkî, fransî, tirkî û hwd ji dema Qazî Muhemed, Şêx Seîd û Seyîd Riza ve bênavber êrîşî axa Kurdistanê dikin. Em dibêjin ku ev hêz bêbext û dagîrker in. Hemû jî ji bo berjewendiyên xwe li bakur û rojhilatê Sûriyê ne. Hêzên Rûsya her roj bi dewleta tirkî re dewriyeyên hevbeş dide meşandin, gelo çima ew ji dagîrkeriyê re nabêje bes e? Berovajî ew xwe bêdeng dikin û hevkariya wan dikin. Dewleta tirk Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî talan û wêran kirin, niha jî dixwaze bi êrîşên ser Eyn Îsa hemleya dagîrkeriyeke nû dest pê bike."

**'Divê em li hemberî dagirkeriyê bêdeng nemînin'**

Di dawiyê de jina bi navê Îman Ebûd ya ji Sirînê bêdengiya civaka navneteweyî şermezar kir û wiha nêrîna xwe bi me re parve kir: "Dewleta tirkî dixwaze bi van êrîşan ewlehiya herêmê bixe nava nakokiyê. Em êrîşan bi giştî û bêdengiya hêzên Rûsya û civaka navneteweyî bi taybetî şermezar dikin. Divê em gelên bakur û rojhilatê Sûriyeyê li dijî êrîş û dagîrkeriyê bêdeng nemînin asta berxwedana xwe bilindtir bikin û axa xwe biparêzin. Di dema dagîrkirina Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî de hêzên navneteweyî dîsa bê helwest man, êdî weke gelên vê herêmê baweriya me bi ti hêzên navneteweyî nayê. Tenê baweriya me bi hêzên me ku zarokên vî gelî ne, tê."

# Azadiya civakê ji azadiya jinê ye

**Hediya HISÊN/Ronahî-Qamişlo**

Ji ber hişmendiya mêr ya serdestiyê, jiyana jinê her dem di binê êrişê de bû û çawa ku tê gotin "Jin darê şkestî ye" rola wê ya di civakê de jî wisa hatibû şkandin. Lê bi şoreşa Rojava re ev rewş hat guhertin û careke din li rola xwe vegeriya.
Debarê mijarê de hevseroka Federasyona Êzîdiyan ya li Şehba Sûad Hiso wiha axivî: "Tundiya li ser jinê êşeke mezin e. Bi navê kevneşopiyan jin bi male ve hatibû girêdan. Bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo jinên Rojava xwe pêş xistin. Şoreşa Rojava bi şoreşa jinê tê naskirin. Çimkî yên li hemberî çeteyên herî bixeter li cîhan şer û têkoşîn kirîn jinên Rojava bûn."
Li ser jinên Êzîdî jî Sûad Hiso wiha got: "Bi taybetî jinên Êzîdî gelek êş kişandin. Heta niha 74 ferman bi serê wan de hatine. 3yê Tebaxa 2014an fermana jinên Êzîdî bû û heta niha jî çarenûsa 2 hezar jinan ne diyar e. Bi saya jinên têkoşer yên YJŞ û YPJê bi sedan jinên Êzîdî hatin rizgarkirin. Wan jinan ji mirinê jiyaneke nû afirand. Ti kes nikare jinên Kurd bişkîne û jiyan bi jinê azad dibe.





Debarê mijarê de endama meclisa Partiya Sûriya Paşrojê Necla Xelef jî wiha axivî: "Jina Kurd xwdiya dîrokeke zengîn e û bi salan e li hemberî dijmin şer dike. Berî şoreşê jin ji bo malê û xwedîkirina zarokan bû. Lê jinên Rojava gavên pir mezin avêtin. Di çeperên şer de li hemberî dijmin milbimil şer kirin. Weke din di her saziyê de jinê cihê xwe girt û bû siyasetmedar. Jina Kurd rengê jina azad derxist holê. Lê hê jî tundiya li ser jinê didome.

# Pêşbirka yekê ya wêjeyî ya Jinên Ciwan bi dawî bû

Pêşbirka yekê ya wêjeyî ya Jinên Ciwan yên Têkoşer ya herêma Raperîn ya başûrê Kurdistanê bi dawî bû. 23 jinên ciwan tevlî bûn.
Pêşbirka yekê ya wêjeyî ya Jinên Ciwan yên Têkoşer ya herêma Raperîn ya çîrok û helbestan bi dawî bû. Pêşbirk 1'ê Mijdarê hatibû destpêkirin. 23 ciwanên Binarê Qendîl, Qeladiz û Ranya tevlî pêşbirkê bûn. Li bajarokê Ranya bi merasimekê xelatên jinên dereca yekê hatin dayîn. Malbatên şehîdan û gelek welatî tevlî merasimê bûn.
Merasima Pêşbirka Wêjeyê ya Jinên Ciwan yên Têkoşer ya herêma Raperîn ku ji bo bîranîna şehîdên jin yên herêma Raperîn hatibû lidarxistin bi qedeyeke rêzgirtina ji bo şehîdan dest pê kir.
Di merasimê de li ser Rêxistina Ciwanên Têkoşer Dîlan Luqman axivî û wiha got: "Ev pêşbirka me beşek ji şiyariyên civak û jinan e. Me ev pêşbirk ji bo bîranîna şehîdên jin yên herêma Raperîn li dar xist. Lewre şehîdan ji çarenûsa heyî re gotin na û rastiya jiyanê nişanî me dan. Li vir her nivîs, helbest û gotar ji bo derxistina qabiliyeta jinên ciwan yên herêma Raperîn e. Em dixwazin çalakiyên me yen wiha yên di warê nivîs, wêje û zimanê kurdî de zêdetir pêş bikevin. Jinên ciwan hest û fikrên xwe bi awayê wêje diyar bikin."
Pişt re jî li ser nave Komîteya Amadekar Mamoste Sazan axivî û diyar kir ku xebata bi vî rengî ya wêjeyî ya ji bo jinên ciwan gelek girîng e.
Di pêşbirkê de jinên tevlî bûyîn berhemên xwe xwendin. Pişt re jî xelatên jinên bûyîn yên dereceya yekê û duduyan ji aliyê dayîkên şehîdan ve hatin dayîn.
Di beşa çîrokan de Niwar Kawa Ehmed bû ya yekê, Sarya Hisinê bû ya duduyan. Di beşa meqaleyê de Ajîn Ebdullah bû ya yekê û Jilwan Ziyan bû ya duduyan. Di beşa helbestan de Zara Ehmed Caf bû ya yekê, Elin Mihemed bû ya duduyan.
Herwiha Komîteya Amadekar spasname pêşkêşî kesên tevlî pêşbirkê bûyîn kir.
Li ser şehîdên jin yên herêma Raperîn sînevîzyonek hat pêşandan.



# Rejima Îranê zora li ser Zeyneb Celaliyan zêde dike

Rejima Îranê mafê hevdîtina bi malbatê re û têkiliya bi telefonê li girtiya siyasî Zeyneb Celaliyan qedexe kirin.
Li gorî nûçeya Tora Mafê Mirovan ya Kurdistanê, rejima Îranê mafê axaftina bi telefonê û hevdîtina bi malbatê re li ser girtiya siyasî Zeyneb Celaliyan ku li girtîgeha Yezd tê girtin, qedexe kirine. Celaliyan hema hema ji tevayiya mafên xwe, hatiye mehrûmkirin.
Heman çavkaniyê ragihand ku dema Zeyneb Celaliyan birine girtîgeha Yezd, carekê tenê rê dane ku têkiliyeke kurt bi malbata xwe re dayne. Çavkaniyê da zanîn ku Celaliyan di wê têkiliyê de ji malbatê re gotiye; "Rêveberên girtîgehê ji min re gotine, heta tu ji xebata xwe poşman nebî û bi hêzên ewlekariyê re hevkariyê nekî, tuyê ji mafên xwe yên di girtîgehê de bêpar bimînî."
Tora Mafê Mirovan ya Kurdistanê ku agahiyên xwe spartine endamekî malabata Celaliyan,



diyar kir ku bavê Zeyneb Celaliyan di rojên borî de li bajarê Mako ji aliyê wezareta Îtalatê ve hatibû destgîrkirin. Hat gotin piştî 24 saetan bavê Celaliyan bi kefalet hatiye berdan.

# Siyasetmedarên Kurd: Divê Hewlêr û Bexda rêzê ji vîna Êzîdiyan re bigirin

**Siyasetmedarên Kurd gotin, divê PDK li hemberî vîna civaka Êzîdî rêzdar be. Mafê ti kesî nîne ku rêveberiya wê herêmê hilweşîne û serdestiya xwe bi ser de bisepîne.**

Endama Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk ya Kurdî li Sûriyê Gulistan Etê li ser mijarê wiha axivî: "Gelê me yê Şingalê gelek azar di dîrokê de dîtin, bi taybetî di 2014'an de. Lêbelê xwe rigzar kir, xwe parast, rêveberiya xwe damezirand û hêzên xwe yên leşkerî ava kirin."

Gulistan Etê got, divê hikumeta başûrê Kurdistanê li hemberî vîna civaka Êzîdî rêzdar be, qebûl bike û hevkariyê pê re bike. Lewre hêza li wir hatî avakirin, ji gelê wê herêmê bixwe ye."

Girêdayî mijarê, endamê rêveber yê Partiya Çepgir ya Kurd li herêma Firatê Kamîran Ginco jî got, "Piştî vekişîna hêzên Iraq û hêzên PDK'ê ji Şingalê û şêniyên wê di nava lepên DAIŞ'ê de hiştin, şêniyên Şingalê çek hilgirtin. Tevlî hêzên gerîla, YPG û YPJ'ê bûn û li hemberî DAIŞ'ê sekinîn. Mafê hikumeta Iraq û başûrê Kurdistanê nîne ku serdestiya xwe li wê herêmê bisepînin û vîna wê têk bibin.



Kamîran Ginco got, "Divê hikumeta başûrê Kurdistanê siyaseta xwe biguherîne û li hemberî dijminê gelê Kurd bisekine. Divê em gelê Kurd li şûna peymanê bi dewleta tirkî ya dagîrker re datînin, parastina xwe bikin."

# "Biryarên dikevin xizmeta dijmin negirin"


**Dilîn EHMED/Ronahî-Qamişlo**

Şêniyên Qamişlo têkildarî aloziya Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDK) derxistî gotin; "Divê li her çar parçeyên Kurdistanê gelê Kurd li hemberî vê helwesta PDKê nerazîbûna xwe nîşan bide û destkeftiyên bi saya şehîdan hatîn bidestxistin biparêze." Herwiha bang li partiyên siyasî yên Kurdî kirin ku ji bo çareserkirinê dest bi diyalogê bikin.

**"DAGÎRKERÊN KURDISTANÊ NE DIJMINÊN PARTIYAN IN DIJMINÊN GELÊ KURD IN"**

Welatiya bi navê Celebiyê Esed li ser mijarê wiha axivî: "Ji bo çareserkirina pirsgirêkan, her tim em bang li partiyên xwe yên siyasî dikin ku dest bi diyalogan bikin û ji şerê birakujiyê dûr bikevin. Çimkî dijminê me li bendê ye ku Kurd bibin dijminên hev. Ji bo pêknehatina planên dijmin pêwîstî bi hevdîtin û diyalogan heye. Bila gel û partiyên me baş bizanin ku dagîrkerên Kurdistanê ne dijminên partiyan in, dijminên gelê Kurd in. Eger em li xwîna şehîdên xwe xwedî dernekevin û destkeftiyên xwe neparêzin, wê dijmin bi hêsanî me tine bike. Ji ber wê divê gelê me têkoşîna xwe xurttir bike û bi şerê taybet yê dijmin, neyê xapandin."

Li ser heman mijarê Nazim Mûsa jî diyar kir ku başûr û rojavayê Kurdistanê di pêvajoyeke hestiyar re derbas dibin û got; "Ji ber ku gelê Kurd bi berxwedan û têkoşînê, çand, ziman, dîrok û hunera xwe parast, dijmin dixwaze van destkeftiyan ji holê rake. Ji ber wê divê gelê me şiyar be û li xwîna şehîdên xwe xwedî derkeve. Aloziya îro li başûrê Kurdistanê derketî xizmeta dijminên Kurdan dike. Ji ber wê em vê aloziyê red dikin û divê çareserkirineke bilez were kirin. Ji şerê navxweyî re em dibêjin bes e."



**"BI BIRAYÊ XWE RE BIBIN ALÎKAR"**

Mihemed Sîrac jî wiha axivî; "Şoreşa Rojava ji bo gelê Kurd derfeteke zêrîn e, eger em destkeftiyên vê şoreşê neparêzin û li ber xwe nedin, wê dijmin xaka me dagîr bike. Ji bo keda salan vala neçe, li hemberî van nakokiyên siyasî û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker divê em li ber xwe bidin. Ji bo planên dijmin pêk neyên, divê em têkoşîna xwe xurttir bikin û bi şev û roj li ser piyan bin. Banga me ji aliyên başûrê Kurdistanê re ew e ku, bi birayên xwe yên Kurd re bibin alîkar û ti biryarên ku bikevin xizmeta dijmin negirin û daxwaziya dijminê me pêk neynin."

# Mezlûm Ebdê: Piştgiriya Kurdan neyê kirin wê DAIŞ bihêz bibe



Mezlûm Ebdê diyar kir ku piştî şkestina çeteyên DAIŞ'ê ji aliyê Kurdan ve hat hiskirin ku cîhanê pişta xwe daye wan.

Ebdê şiyariya ku dibe DAIŞ bihêz bibe, da.

Nûçegihana Radyoya Dewleta Swîsre (Sr) ya Navneteweyî Cecîllîa Uden, bi Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdê re hevpeyvînek kir. Ebdê welatên ku li hemberî bûyerên li bakur û rojhilatê Sûriye diqewimin bêdeng in û ji bo jinûveavakirina welat bi qasî pêwîst destekê nadin, rexne kirin.

Udden diyar kir ku Ebdê daye zanîn ku şer qediyaye lê pirsgirêk dewam dikin û Kurd ketine wê hisê ku cîhanê pişta xwe daye wan.

Ebdê bîr xist ku şerê îdeolojîk yê li gel şerê leşkerî yê bi DAIŞ'ê re hê bihêztir e û diyar kir ku pêwîstî bi dem, çavkanî û angajmana heye. Herwiha got, "DAIŞ pirsgirêka hevpar ya cîhanê û têkoşînkirina bi cîhana ramanê ya DAIŞê re di berjewendiyên her kesê de ye."

Ebdê da xuyakirin ku piştî şer Hêzên Sûriyeya Demokratîk bi armanca çeteyên DAIŞ'ê û zarokên wan ji Islama sexte rizgar bikin, xebat dane destpêkirin û li ser vê yekê jî agahî parve kirin. Ebdê diyar kir li bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo çeteyên DAIŞ'ê ji ramanê redîkal paqij bikin, wê 16 navendên nû ava bikin.

Ebdê got, ji bo jin, zarok û girtiyên din pêwîstî bi navendên nû heye. Ji bo vê jî Kurd ne xwedî çavkanî û pisporên pêwîst in. Ebdê diyar kir ku pêwîstiyên gel yên mîna kar, xizmetên civakî, elektirîk, av neyên pêşwazîkirin hişyarî kir ku dibe çeteyên DAIŞ'ê ji nû ve bihêz bibin.

Udden diyar kir ku Ebdê yê 53 salî generalek e ku çeteyên DAIŞ'ê têk birine. Çeteyên DAIŞ'ê li warê Ebdê Kobanê tarûmar bûn, rizgariya Kobanê jî destpêka serdemekê bû.

*Çavkanî: ANF*

## Fener



### 'Qaz Bi Refa Xwe Re Baz E'

**Idrîs HENAN**

Bi guherînên stratejîk ên di bingeha sîstema serweriya cîhanî de rûdidin re, derdor jî hewl dide rûyê xwe li gorî pêşketina bi lez a hêza guherînê bizivirîne. Hinek jê mîna kîsoyan û hinek jî weke kêrgûyan lê hatiye. Ji xwe yên di navberê de jî ku li şûn projeyan mane, di nav lingan de diçin. Kesên han tenê bejna xwe fena qewaqan bilind kirine û bi bayê berjewendiyên biyanî re ha wêde zivirîne û ha vir de fitilîne. Ewqas stûdirêj bûne êdî mirov seriyê ku hucreya mejî ye ferq nake!. Piştî ku Bonapart li ber tixûbên Austirya bêhna xwe ya dawî dikişand, nandozekî ji wî welatî kilîtên kelehê radestî wî kirin û tişta ku Bonapart bi şer nekariye pêk bîne, bi rêya qeleşekî xwefiroş ê beredayî kir. Piştî ku derbasî wî welatî dibe buxçikek dirav davêje rûyê wî xinizî û ji bo silavê destên xwe nadiyê. Leşkerên xwe matmayî dimînin û sedema reaksyona wî jê dipirsin. Bonapart wiha bersiv dide: "xayînê welat fena wî kesî ku ji bo komek dizan ji bavê xwe diziyê bike. Ne bav wî diborîne û ne jî diz wî spas dikin".

Qewaqên ku bi salane rûyên xwe vir de wir de zivirandine, ti cihekî wan di nav vê guherînê de nîne. Fena wî nankorê Austiryayî lê hatiye ku êdî tenê buxçikên diravan li rûyên wan dikevin. Lê ti kes destê silavê dirêjî wan nake. Ewqas li derveyî refa neteweyî firiyane, êdî deng an navên wan guhên mirovan diçirimînin. Ji xwe di bingeha avabûna karîzma xwefiroşiyê de psîkolojiya "ji bo tiştên erzan firotina tiştên buha" di nava pêşbirkeke ecêb de ye. Ji lew re nirxên mîna exlaq, wefedarî, dilsozî û rûmet di ferhenga wan de nîne. Berovajî; vedîtina rêbazên cehşîtiya kor a bê beramber li cem wan xuliqkar e. Dikare ji her pratîkeke xwe re wate û maneyekê bidin. Her tiştî normalîze dikin û cehşîtiyê weke çand didin rûnişkandin. Ev yek di nav aloziya li herêmê û bi taybet a li Sûriyê qewimiye de, weke tablo hate nîgarkirin ku kes, cemaet, rêxistin û komên veguherîne nandoz û li dijî netew, welat û nirxên xwe şer kirine bi hişmendiya cehşîtiyê mezin bûne ku îro li her derê di oxira berjewendiya karbidestên xwe de fena tajiyan dimirin û difetisin. Çiqas gotin giran be, lê mixabin rastiya li ser erdê ev e. Ger ne wisa be, gelo çi karê Sûryeyiyan li Lîbya, çolistana Sîna, Afrîqya û Qoqazê heye? Ango; çi karê heft fesîleyên bi navê kurdan di nav êrişên li ser Efrînê û Serêkaniyê de hebû? Yan jî îro çi karê Gedo li Efrînê û hevalbendên wî li dora Garê, Qendîl û Şengalê heye? Eger ev kar ne normalîzekirina cehşîtiyê û tekûzkirina dagirkeriyê be, gelo kî dikare navekî din lê bike?

Dagirkerî hewl dide bi rêya aktîvkirina sîstema cehşîtiyê xwe ji qeyrana bayê guherînê biparêze ku bi kêmanî tiştek bi dest neket, tiştên heyî ji dest nede. Lê xinizên ortê ku bi hişmendiya bazirganê her tiştî ji kirîn-firotinê re mubah dike, tev digerin, bê guman wê bi babelîska guherîner re di nav lingan de bixeniqin. Pêşiyan vale vale ne gotine; teyrê ku li derveyê refa xwe bifire zû dikeve. Ango "qaz bi refa xwe re baz e".



# KNK'ê encama civînên xwe yên li Başûr eşkere kir

**Şandeya KNK'ê têkildarî encama hevdîtinên xwe yên li Başûr, daxuyaniyek da çapemeniyê. KNK'ê diyar kir ku ji bilî PDK'ê, bi partiyên Başûr tevan re civiyane û helwesta wan erênî bûye. Hevserokê KNK'ê diyar kir ku daxwaziya hevdîtinê ji PDK'ê kirine, lê hê bersiv nedaye.**

KNK'ê li Sînemaya Salim ya Silêmaniyê têkildarî encama hevdîtinên xwe yên başûrê Kurdistanê, civînek çapemeniyê li dar xist.

Di civînê de Hevserokê KNK'ê Ehmed Qeremûs ev agahî dan: "Piştî derketina aloziyê di navbera PDK û PKK'ê de, ji bo çareserkirinê em hatin başûrê Kurdistanê. Destpêkê em li gel Seroka Parlementoyê civiyan. Pişt re derveyî PDKê li gel aliyên din yên siyasî tevan em civiyan. Diyaloga me li gel tevan bi awayekî erênî derbas bû."

Qeremûs diyar kir ku ji tevan re dane xuyakirin ku armanca wan ew e ku dawiyê li nakokiyan bînin, hêz vegerin cihên xwe yên bere û bi diyalogê pirsgirêkê çareser bikin.

Qeremûs da zanîn ku aliyan tevan bi kêfxweşî piştgiriya xwe ji bo van hewildanên KNK'ê nîşan dane û diyar kirine ku li dijî şer in.

Hevserokê KNK'ê da zanîn ku xwestine bi PKK'ê re jî bicivin, lê ji ber rewşa ne guncaw şandeya wan nikariye yekser pêk bîne. Qeremus diyar kir ku PKK'ê bi peyamekê bersiva wan daye û helwesta xwe ji bo aşitiyê nîşan daye. Qeremûs da xuyakirin ku PKK'ê di peyama xwe de diyar kiriye ku ew jî dixwazin pirsgirêkê bi diyaloga neteweyî çareser bikin.

Têkildarî helwesta PDK'ê jî Qeremûs wiha got: "Me hewil da li gel Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî, Serokê Herêmê Nêçîrvan Barzanî û Serokê Hikûmetê Mesrur Barzanî bicivin, ji bo vê me daxwaziya xwe pêşkêşî wan kiriye, lê heta niha bersiv nedane. Hêvîdar in bersiva me bidin."



# Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê diyar kir ku agahiya girtina balafirên keşfê derew e

Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê da zanîn ku agahiyên girêdayî radestkirina hêzên Koalisyona Navneteweyî ya balafirên keşfê ya meclisê ne rast in.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriya Demorkatîk (QSD) têkildarî nûçeyên ku dibêjin Koalisyona Navneteweyî balafirên keşfê radestî Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê kirine, daxuyaniyek li ser malpera xwe ya fermî weşand.

Di daxuyaniyê de hat gotin balafir yên koalisyonê ne û şervanên Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê wêneyên wan kişandine. Herwiha meclisê negirtine.

Navendê di nûçeya ku belav kiriye de wiha got: "Koalisyona Navneteweyî û Meclisa Leşkerî ya Dêrezorê ji bo tinekirina şaneyên DAIŞ`ê yên veşartî bi hev re kar dikin."

# Çeteyên dewleta tirkî 7 ciwan ji Girê Spî revandin

Çavkaniyeke ji kantona Girê Spî diyar kir ku çeteyên artêşa tirkî li bajêr û gundewarê bajêr bi ser malan de girtin û 7 kes ravandin.

Li gorî çavkaniyê çeteyên artêşa tirkî ji gundê Qeyseriyê yê gundewarê başûrê Girê Spî 4 kes ravandine. Çavkaniyê da zanîn ku kesên hatîn revandin, ji eşîra El-Hinada ne.

Çavkaniyê herwiha da zanîn ku çeteyên bi navê Cebheta El-Şamiyê ji gundewarê rojhilatê Girê Spî jî 3 kes ravandine û hemû ji eşîra El-Meşhûr in.



28`ê meha derbasbûyî li rojhilatê taxa Girê Spî di navbera eşîra El-Meşhûr û çeteyên Cebhet El-Şamiyê de şer derketibû. Di encamê de ciwanê bi navê Beşar El-Seed ku li dikana telefonan dixebitî hat kuştin. Herwiha li kolanan gule hatin reşandin û du kesên din birîndar bûn.

# HRE: Li Şêrawa 5 çete hatin kuştin û 4 wesait jî hatin teqandin

Hêzên Rizgariya Efrînê ragihand ku hêzên wan li gundê Basûtê ya navçeya Şêrawa li hemberî çeteyên dagîrker çalakiyeke taybet kirine û di encamê de 5 çete hatine kuştin û 4 wesait jî hatine teqandin.

Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) têkildarî mijarê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Daxuyanî wiha ye:

"27`ê Mijdarê, li gundê Basûtê yê navçeya Şêrawa hêzên me li hemberî çeteyên dagîrker çalakiyeke taybet lidar xistin. Di vê çalakiyê de baregehek çeteyan bû hedef û di encama çalakiyê de 5 çete hatin kuştin, 4 wesait jî hatin teqandin. Em li vir careke din dubare dikin ku heta kiryarên dermirovî yên çeteyên dagîrker li ser gelê me dimeşîne dewam bikin, çalakiyên me yên tolhildanê jî bi awayekî xurttir wê dewam bikin."

# Dewleta tirkî careke din av li ser Sûriyê qut kir

Rêveberiya bendava "Tişrîn" ragihand ku di salekî de ev cara duduyan e ku dewleta tirkî asta ava çemê Firatê ku derbasî erdê Sûriyê dibe kêm dike.

Rêveberê bendava "Tişrîn" Mihemed Terboş diyar kir kir ku asta ava çemê Firatê ya ku diherike nava erdê Sûriyê kêm bûye.

Mihemed Terboş diyar kir ku bendavê hewcedarî avê bi rêjeya 300m² di xulekekî de ye da ku tûrbinekê ji bendava Tişrîn yan jî bendava Firatê bixebite û kehrebê bide. Kêmbûna avê bandora kehrebayê ji bajar û bajarokên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Herwiha rêveberiya bendavê ji ber girtina avê, hişyarî da.



Li gorî peymana di navbera dewleta tirkî û Sûriyê ya sala 1987`an de, divê rêjeya derbasbûna avê nava erdê Sûriyê 500 m² di xulekekî de be.

Dewleta tirkî 6 bendav li ser çemê Firatê çêkirine, ji wan bendava Ataturk ku ji mezintirîn bendavên li Rojhilata Navî ye.



### Nagorno-Karabax, Ermenî û Azerî

**Derwêş M. FERHO**

Ermenî bi giştî ji lihevhatina Ermenîstan û Azerbeycan bi navbertiya Rusan ne razî ne. Tewra Rusya bi xiyanet dibînin. Di baweriyê de ne ku Rusan ji piştê ve xencar li wan xistiye. Raya giştî jî, ji çend bertekên sembolîk pê ve, bêdeng ma.

Moskowa di dema şerr de sar sekinî. Li pey hevalbendê xwe Ermenistan nesekinî. Çavek ji dewleta Turk re, yê din ji Azeriyan re diqermiçand. Ji rayedarên Ermenistan re jî pişo-mişo dikir. Li fersendê digeriya tiliya xwe bike nava helawê. Dema hêzên Azerbeycan bi alîkariya dewleta Turk dest danî ser gelek herêman, fersend ji Moskow re vebû. Bangî Ermeniyan kir û bi Azeriyan re li ser masê li Moskow da runandin. Herêmên ji destê Ermeniyan çûn ketin destê Azeriyan pejirand. Lê şertên xwe jî bi her du aliyan da qebûlkirin. Hêza xwe ya leşkerî li wê herêmê bi cî kir. Tiştekî ku berê bes li aliyê Ermeniyan mimkin bû, niha di herêmên Azeriyan de jî pêkanî û asayişa pirraniya herêmê xist bin kontrola xwe.

Dewleta Turk li pêş çavê hemû dinyayê bi her awayî alîkariya Azerbeycan kir. Herêmên mayî jî di metirsînê de ne û Ermeniyên mayine di fikara cîguhestinê de ne. Ji ber hêviyên wan hat şikestin, bê hêz û bê pişt man.

Gelê Ermenî, li Ermenîstan û li diyaspora ev tiştê bi serê wan hatiye xiyanet dibînin. Çawa ji Rusya ne razî ne, ji rayedarên xwe di bin pêşengiya Nikol Paşinciyan jî nerazî ne. Lê Nikol Paşinciyan çi dikarîbû bike. Azerbeycan di her warî de bi hêztir bû. Turkan jî wek dewlet, bi hêzên leşkerê xwe û çeteyên ji Suriyê biribûn li pişta Azeriyan sekinî. Hêza Eermeniyan di hember Azerbeycan de bêçare bû. Dunya jî bêdeng, kerr û lal ma. Ermenistan tenê ma. Hewldanên diyaspora Ermenî jî têra tu tiştekî nekir. Encam; Azerbeycan bi ser ket, qezanca Rusan di herêmê de zêde bû. Ermenîstan jî piştşikestî ma.

Ermenî çi hunda dikin? Temamiya herêmên ku di salên 90î de bidest xwistibûn û hin derên din di Nagorno-Karabaxê de ji dest wan çûn. Şer domkiribane bajarê Stepanakert jî li ber ketinê bû. Wê demê Nagorno-Karabax bi temamî diçû. Dewleta Turk bi rêya Azerbeycanê ket herêmê. Hebûn û mayina dîn dijminê Ermenistan, hêzên dewleta Turk jî êdî rastiyek e. Ewê hem li Azerbeycan hem li wan herêmên îşgal kirî bimînin. Turk jî mîna Rusan di vî aliyê siyasetê de xwedî tecrûbe ne. Ciyê dikevinê bi zehmetî der diçin. Bakurê Kurdistan di bin dagirkeriya wan de ye, niha li Başûr in, li Suriyê ne, li Rojava ne, li Libya ne û niha jî Nagorno-Karabax. Mayina wan li wê derê bi dilê Azebeycane jî. Ji dewleta Turk re xêra xwedê, lê ji nişteciyên Ermenî re xezaba Xwedê. Ermenîstan çi dikare bike? Zeîf û bê pişt e.

Lê divê meriv ne her sucî biavêje aliyê Azerbeycan, Turkiyê yan Rusya. Çiqasî ev hêz sucdar bin hêzêdetir rayedarên Ermenîstan jî sûcdar in. Dema Azerbeycan aboriya xwe xwurt dikir, hêza leşkerî bi alîkariya Turkiyê û Îsraîl piştrast dikir, çek dikirîn û mutehasisên leşkerî kirê dikir, li Ermenistan gendeliyê di her qadî de xurt bûbû. Di dema li Ermenistan gendelî lotik diavêtin Azerbeycan di van 20 salan de di warê leşkerî de ji temamê budceya Ermenîstanê zêdetir mesref kiribû. Ev gendelî li Azerbeycan jî heye. Lê qet nebe hêza xwe ya dewletî mezin kir. Loma jî dikarîbû Ermenistan tenê bihêle. Car din xuya bû ku di siyasetê de hevalên daîmî nînin.